

15ê Gulanê Cejna zimanê kurdî

Di encama şerê cihanê yê yekê de, dewletine nû li Rojhilata navîn hatin damezrandin, û gelê Kurd û welatê wî jî li ser çend dewletan ji wan hatin parvekirin.

Piştî ku heyama siyasî li Rojhilata navîn rawestî, û sînorên navdewletî yên nû hatin çespendin, ew dewletên ku Kurdistan li ser wan hati bû parvekirin, siyasatên tunekirinê di tenga gelê Kurd re ajotin.

Wan li destpêkê dest avêtin zimanê kurdî, û xwendin, nivîsandin û dengkirina bi kurdî jî qedexe kirin, û herweha, hebûna zimanê kurdî û gelê Kurd bi xwe jî ketin tirsdariyeke rastîn.

Mixabin, ew helwest û siyasatên li dijî şaristanî û mirovatîyê, ra dema niha û bi şeweyên birêkûpêk tîn meşandin, û zimanê kurdî û gelê Kurd jî hîn di rewşên ne azad de ne.

Di ew rewşên kambax û dijwar de, gelê Kurd û lawên wî yên zana û dilsoz, herdem û ta roja îro berxwe didin. Yek ji lehengên herî gewre di warê zanîna zimên û çanda Kurdî de, Mîr Celadet Bedirxan bû.

Mîrê gewre Celadet Bedirxan, li destpêka salên sihî ji sedsala bîstan Abeya kurdî ya latînî danî û kovara HAWARÊ pê weşand. Wî bi ew karê xwe yê pîroz, şoreşeke rastîn di warê zimên û çanda kurdî de rakir.

Hejmara yekê ji kovara Hawarê di roja 15ê meha Gulanê ya sala 1932an de ronî dît. Loma jî, roja derçûna wê di jiyana û vejîna zimanê kurdî de, rojeke pir naskirî û zor pîroz e.

Lê, mîna ku em dizanin, ew şoreşa ku Mîr Celadet di warê vejîna zimanê kurdî de dabû destpêkirin, hîn bi dawî nebûye. Ji ber ku hîn tunekirina zimanê kurdî di navîka nîşana neyaran de ye, û bi tundî dijîtiya hebûna wê tê kirin.

Loma jî, li sala 2006an, hin rêxistinên netewî û saziyên rewşenbîrî li Bakurê Kurdistanê, roja derçûna kovara Hawarê, ango roja 15ê meha Gulanê, wek "Cejna zimanê kurdî" ragihandin, û ji sala 2009an de, li sê rojan (14-15-16ê Gulanê) çalakiyên taybet di warê vejîna zimanê kurdî de li dar dixin.

Saziya me jî, "Saziya parastin û fêrkirina zimanê kurdî li Sûriyê", biryar da, ku piştgiriya wê pêşinyarê bike, rojên (14-15-16ê) ji heyva Gulanê mîna cejna zimanê kurdî bipejîrîne, û li gor rewş û derfetan, kar û çalakiyên taybet di ber parastin û geşkirina zimanê me de bike.

Li gor heyam û rewşên tevahî, ku roja îro li Sûriyê hene - mîna qedexekirina hemî çalakiyên Kurdekeriyê jê re navnîşan e - dîsa jî, her mirovek û maleke Kurd, kane di hersê rojên "Cejna zimanê kurdî" de bi gelek karên giring di warê hezkirina zimanê xwe de rabe.

Banga me ji her mirovekî Kurd re, ku em bi hev re zimanê xwe biparêzin, bikaranîna wê bikin erk û li hebûna wê xwedî derkevin.

Ji bo pêkanîna cejna zimanê me- wek mînak- em van kar û stubariyan ji her kurdekî re pêşniyar dikin:

* Nameyên piştgirî û pîrozkirinê di riya SMSan re, bi boneya Cejna zimanê kurdî ji hev re bişînin.

* û sûdar. Di hersê rojên cejnê de, biçûk û mezin, jin û mêr, û hemî endamên malên Kurdan -ku zimanekî din jî di mal de bi kar tînin- tenê bi kurdî baxivin, û bi kar wînin.

* Biçûk û mezin xwe fêrî xwendin û nivîsandina kurdî bikin, û çîrok û nivîsên kurdî di malan de werin xwendin.

* Têbîn, tiştên xwe yên taybet, nav û nimreyên telefûnan, çî di defteran û çî di mobaylan de, bi kurdî binivîsin. **D.R (4)**